Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 396 | nameronahi@gmail.com | 15- Hezîran - 2018 | Rojnameya Siyasî û Çandî



## Tebqayê dest bi komkirina sebzeyên havînê kir



Cotkarên gundewarên Tebqayê dest bi berhevkirina sebzeyên havînê kirin.
Cotkarên gundê El-Cirniyê ya herêma Tebqayê dest bi berhevkirina sebzeyên havînê kirin.
Qutkirina ava çemê Firatê ji aliyê dewleta dagirker a Tirkiyê de ku ev bûye 8 meh in dodome, her wiha derketina gelek stasyonên avê ji xizmetê bû sedem ku berhemên îsal li beramberî salên derbasbûyî pir kêm be.
Her wiha baran û lehiya ku di dawiya buharê de bariya hişt ku gelek berhem zerarê bibînin.
Cotkar Elî Salih wiha got: “em berheman berhev dikin, dişon û pişt re dixin tûran. Beşek ji wê difroşin bazarên herêmê û ya zêde ji herêmên din re dişînin.” *ANHA*

## Dewreya Dîsîplîna Leşkerî bi dawî bû





Yekîtiya Dîsîplîna Leşkerî 4’emîn dewreya xwe bi merasîmekê bi dawî kir.
Li Akademiya Şehîd Siyamend a girêdayî Yekîtiya Dîsîplîna Leşkerî 4’emîn dewreya dîsîplîna leşkerî ya bi navê Şehîd Fîras Kobanê ku 30 endam beşdarî wê bibûn bi merasîmekê hate bidawîkirin. Dewre 45 rojan dewam kir û têde waneyên siyasî, fikrî, bîrdozî û leşkerî hatin dayîn.
Di merasîmê de Endamê Rêveberiya Yekîtiya Dîsîplîna Leşkerî Şahîn Ebdullah axivî û bi dawîkirina dewreyê li hemû endaman pîroz kir û got ku piştî vê dewreyê êdî endamên beşdar divê bi rihekî berpirsyar tevbigerin.
Piştre endamên beşdarî dewreyê bûne sond xwarin.
Endamê bi navê Yezen Mûsa diyar kir ku ew bi beşdarbûna xwe ya nava vê dewreyê gelekî kêfxweş e û destnîşan kir ku dê bi hemû hêza xwe bajarê xwe birêxistin bikin û bang li hemû ciwanan kir ku cihê xwe di nava xebatên pêşxistina bajarê xwe de bigirin.
Merasîma bi stranên şoreşgerî û gerandina govendê bi dawî bû... ANHA

## Bi hatina cejnê sûk geş bûne





Welatiyên herêma Firatê amedekariyên xwe yên Cejna Remezanê didomînin, welatî şêranî, cil û bergan li sûkê dikirin.
Li sûkên Herêma Firatê yên Kobanê û Girê Spî tevgera cejna remezanê heye. Welatî li sûkê pêdiviyên xwe yên cejnê bi cih tînin.
Di nava sûka Kobanê de de walatiya bi navê Zêneb Wêso kêfxweşiya xwe anî ziman û got: “Em bi cejnê kêfxweş in, em bi hêvîne ku di cejnên pêş de şer bi dawî bibe.”
Dayîka bi navê Xedîca Mehmûd diyar kir ku ev cejn ji ya sala derbas bûyî baştire.
Dikandarê bi navê Mihemed Bozan li ser mijarê wiha axivî: “Di nava sûkê de kirîn û firotin normale, cil û berg li gor rewşê ne zêde bûhane. Em bi hêvîne ku cejin bi xêr û xwaşî der bas bibe.”
Welatiyê bi navê Fêsel Eyûb jî da zanîn ku bi nêzikbûna Cejna Remezanê ew hatiye sûkê û destnîşan kir ku ew ê şîranî ji bo cejinê bikire.
Endama Nexweşxwaneya Kobanê Evîn Ebdo diyar kir ku wê di rojên cejinê de nexweşxane 24 seatan vekirîbe û wê nobet were zêde kirin.
Rêveberê Asayîşê Mihemed Hisên jî derbarê amadekariyên wan yên ewlekariya cejnê de wiha axivî, “em weke hêzên Aseyîşê ji bo parastina bajêr me hin biryarname derxistine. Zagon jî ji 13’ê meha hezîranê de qedexe kiriye û motorsklêt û tirimbêlên mezin di nava bajêr de bigerin.”Welatiyên Girê Spî jî cejna îsal taybet dibîni. Ciwanê bi navê Hemze Yûsif diyar kir ku ew kêfxweşin ku wê cejnê bi aramî pêşwazî bikin...*ANHA*

## Leşkerên Tirk dêrên xiristiyanan talan dikin



Leşkerên Artêşa Tirk a dagirker li Efrînê, dêra Maroniya a xiristiyan talan kirin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, kirinên xwe yên li Efrînê yên weke dizî, talankirin, revandina sivîlan, eşkencekirin û guhetina demografiya herêmê didomînin. Li gel van binpêkirinan jî şaristaniya ku vedigere 3 hezar salan rûxandin û deverên dîrokî û pîrozgehên Êzidî û Suryan û Elewiyan xirab dikin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê Dêra Maroniya ya xiristiyan ya li gundê Beradê a navçeya Şêrawa piştî ku tiştên dîrokî yên te de talan kirin dest bi kolandina hundirê dêrê kirin.
Dagirkeran di êrîşên xwe yên li ser Efrînê de dêrên Mar Maron û ya Jolyanus ku kevintirîn



dêrên xiristiyanan di cîhanê de hilweşandin.
Dîroka avabûna herdu dêran vedigerin sedsala 4. berîzayînê.
Çeteyan hefteya derbasbûyî de navenda Yekîtiya Êzidiyan a Efrînê rûxandin û peykerê Zerdeşt teqandin, her wiha pirtûkên tê de şewitandin...*ANHA*




Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com | Hejmar : 396 | 15- Hezîran - 2018 | Rojnameya Siyasî û Çandî

### HSK’ê alîkarî şand ji Efrîn û Bakurê Kurdistanê re

Heyva Sor a Kurdistanê bi wesîleya meha Remezanê di çarçoveya kampanyaya fitre û zekatan alîkarî kom kir. Heyva Sor a Kurdistanê 60 hezar eûro şand ji gelê Efrînê yên ku ji ber êrîşan li herêma Şehbayê bi cih bûne.



Heyva Sor a Kurdistanê 200 hezar eûro jî şand ji gelên Sûr, Cizîr, Şirnex, Silopî, Hezex, Nisêbîn û Geverê yên ku dewleta Tirk ev bajar hilweşandibû. *R-6*

# ÊRÎŞ LI SER TEVAHIYA KURDISTANÊ YE

*Rêjîma dewleta Tirk ya dagirker ku di nava krîz û aloziyeke mezin de ye bi dijminatiya li Kurdan hewl dide xwe xwe jê rizgar bike û desthilatiya xwe li ser lingan bihêle. Dewleta Tirk piştî Efrînê niha jî êrîşî başûrê Kurdistanê dike û hewl dide xwe li wir mayînde bike.*



### EM RÊ NADIN DAGIRKERIYÊ

Nerazîbûnên li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ya li dijî başûrê Kurdistanê zêde dibin. Pêşmergeyên Dêrîn ên li dijî dagirkeriya xaka Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê diyarkirin ku li ser vê xakê wê şehîd bikevin lê rê nadin leşkerên Tirk bikevin Qendîlê û gotin: “Eger leşkerên Tirk bikevin Qendîl wê nekarin carekî din jê derkevin.” *R-2*

### LI DIJÎ ÊRÎŞAN YEKÎTIYÊ AVA BIKIN

Partiya Aşti ya Demokratîk a Kurdistanê û Partiya Demokratîk a Kurdên Sûriyê PDKS’ê bi daxuyaniyên cûda bang li hikûmetên Hewlêr û Bexdayê kirin ku bi berpirsyariyên xwe rabin û li dijî dagirkeriya Tirkiyê li Başûrê Kurdistanê bibin xwedî helwest. Her wiha bang li aliyên Kurd kirin ku li dijî êrîşan yekîtiya xwe ava bikin. *R-4*


### DIVÊ PARLEMENTO HELWESTÊ NÎŞAN BIDE

Parlamenterê Tevgera Goran yê başûrê Kurdistanê Ebdulreman Elî diyar kir ku kiryarên dewleta Tirk hemû sînor derbas kirine û gihiştiye asta dagirkeriyê û got; “Eger pêşiya vê dagirkeriyê neyê girtin, wê metirsiya dagirkirina Kerkûk, Silêmanî û herêmên din jî pêk were. Bêdengiha parlementoya Herêma Kurdistanê rewşê xirabtir dike.” *R-4*

### ÊRÎŞ LI SER TEVAHIYA KURDISTANÊ YE

Partiya Yekîtiya Demokraîtk PYD’ê têkildarî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yên li dijî Başûrê Kurdistanê daxuyanî da û bang li tevahî partiyên Kurdistanî kir ku demildest Kongreya Netewî ya Kurdistanê li dar bixin. PYD’ê got, “Êrîşa li ser başûrê Kurdistanê êrîşa li ser tevahiya Kurdistan û Iraqê ye.” *R-5*

### Divê cejn bibe wesîleya hesab pirsînê




Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA GEL bi wesîleya Cejna Remezanê peyamek da û cejna gelê Kurd û alema îslamê pîroz kir. Kongra Gel desnîşan kir ku ew di nava şertên zehmet de cejnê pîroz dikin û got, “Divê ev cejn bibe wesîleya piştgiriya civakî û netewî. Divê Cejna Remezanê bibe wesîleya hesabpirsîn û rêxistinbûna gelê me ya li dijî dijminên Kurdan.” *R-6*

### Em li Minibicê Tirkiyê naxwazin



Tirkmenên Minbicê diyar kirin ku piştî QSD’ê Minbic ji DAIŞ’ê rizgar kir ew ji her demê zêdetir azad in, jiyana wan aram e û gel wekhev dijîn û anîn ziman ku ew dewleta Tirk li Minbicê naxwazin. Tirkmenan got, “Dema ku DAÎŞ’ê li Minbicê teror dikir, Erdogan û leşkerên Tirkiyê li ku bûn? *R-5*

### Li Efrînê milkên sivîlan talan dikin



Rêxistina Çavdêr a Mafên Mirovan ragihand, li Efrînê ya dagirkirî komên bi ser Tirkiyê ve dest li ser mal û milkên Kurdên sivîl datînin û talan dikin. Wekîlê Dîrektorê Rêxistina Çavdêr a Mafê Mirovan, a Rewşên Lezigîn Prîyanka Motaparty got, “’Ev komên çekdar mafê sivîlên bê parastin naparêzin, berovajî pergala binpêkirinê didomînin.’’ *R-4*

### Rizgarkirina Efrînê cejna herî mezin e



Bakurê Sûriyê û Rojava cejna remezanê pîroz dikin. Lê welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk û dagirkirina Efrînê vê cejnê li derveyî Efrînê û xemgînî pêşwazî dikin. Welatiyên Efrînê yên li kampa Berxwedanê diyar kirin ku ji bo wan cejna herî mezin rizgarkirina Efrînê ye. *R-6*

### Fermandarê Îranî dewleta Tirk derewand



### 30 jinên ciwan tev li YPJ`ê bûn

Jinên bakurê Sûriyê kom bi kom beşdarî xebatên parastinê dibin. Jin li Rojava û bakurê Sûriyê di bin pêşengiya YPJ’ê de di warê parastinê de bi roleke girîng radibin. 30 jinên ciwan piştî ku dewreya perwerdeyê li Akademiya Şehîd Rojda a bajarê Minbicê bi dawî kirin, tev li nava refên YPJ`ê bûn. *R-3*



# Em rê nadin Tirk bikevin Qendîlê

***Nerazîbûnên li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ya li dijî başûrê Kurdistanê zêde dibin. Pêşmergeyên Dêrîn ên li dijî dagirkeriya xaka Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê diyarkirin ku li ser vê xakê wê şehîd bikevin lê rê nadin leşkerên Tirk bikevin Qendîlê û gotin: "Eger leşkerên Tirk bikevin Qendîl wê nekarin carekî din jê derkevin."***

Pêşmergeyên Dêrîn ên li dijî dagirkeriya xaka Başûrê Kurdistanê berê xwe dan Qendîlê diyarkirin ku li ser vê xakê wê şehîd bikevin lê rê nadin leşkerên Tirk bikevin Qendîl û gotin: "Eger leşkerên Tirk bikevin Qendîl wê nekarin carekî din derkevin."
Her ku diçe nerazîbûnên gel ên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê zêde dibe. Di vê çarçoveyê de Pêşmgergeyên Dêrîn serdana Qendîl kirin û diyar kirin ku ew li pişt Qendîl in. Pêşmergeyên Dêrîn piştgiriya xwe ya ji bo çalakiya mertalên zindî yên Ciwanên Welatparêz ên li dijî dagirkeriyê li Qendîlê dabûn destpêkirin, kirin. Pêşmergeyên Dêrîn têkildarî serdana xwe ji ANF'ê re axivîn.

### DIVÊ HEMÛ ALÎ XWEDÎ HELWEST BIN

Hekem Cengijî diyar kir ku ji bo piştgiriya çalakiyên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistan û Qendîlê hatine vir û got: "Dewleta Tirk hewl dide ku xaka Başûrê Kurdistanê dagir bike. Em ê ji niha û şûnde kar bikin ku welatê xwe azad bikin. Ev demek Başûrê Kurdistanê aram û bi awayê nîv azad dijî, lê di roja me ya îro de dewleta Tirk hewl dide ku dîsa dagir bike. Di pêvajoyeke ev qas dijwar de hikûmet û partiyên siyasî xwedî helwestekî ne diyar in. Di vê hemû alî li dijî dagirkeriyê xwedî helwest û biryar bin."

### BIKEVE NIKARE DERKEVE

Cengijî destnîşan kir ku ev der Qendîle ti hêz nikare bikeve nav. Em canê xwe li ser vê xakê didin, rê nadin leşkerên Tirk pê li axa Qendîl bike. Cengijî got: "Eger leşkerên Tirk bikeve Qendîl wê nekare derbikeve."




### BANGA LI XWE VEGERÊ

Hekîm Cengijî bal kişand aliyên ku hevkariya dijminê Kurdan dike û got: "Li vir bang li alîgirên hevkarî û sîxûriyê ji bo dewleta Tirk a faşîst dikin ku li dijî gelê xwe êrîş dikin, werin dev ji vê kiryarên xwe berdin. Werin em bi hev re yekîtiyê ava bikin û li dijî dijminê bi salan tê bikoşin. Eger em bibin yek ti hêz nikare guleyekê jî li nav xaka me biteqîne.

### HELWESTÊN XWE ZELAL BIKIN

Pêşmergeyê Dêrîn Omer Kake jî diyar kir ku ew ê heta dawî piştgirî û piştevaniya Qendîlê bike. Kake got: "Ez li vir bang li hikûmeta Herêma Kurdistan û Hikûmeta Bexda dikim ku bibin xwedî helwestekî zelal, îro dewleta Tirk a dagirker her roj tê xaka Başûrê Kurdistan û Iraqê derbas dike. Li gel vê jî her roj di encama bomberdûmana wan de welatiyên sivîl tên qetilkirin."
Kake bal kişand ser dagirkeriya dewleta Tirk a xaka Kurdistanê û got: "Dewleta Tirk a faşîst çawa Efrîn dagir kir, îro dixwaze gund û bajarên Başûrê Kurdistanê jî dagir bike. Ez li vir bang li her kesê dikim ku ketina Qendîl ne hêsan e, her demê Qendîl bûye hêlîna gerîla û pêşmergeyan. Gerîla heta şehîd bibe, çiya û xaka xwe bernade. Li ser vî bingehî bang li hemû gelê Başûrê Kurdistanê dikim ku gerîla ji bo hemû Kurdistanê xebt dikin, werin bibin palpişt."

## Gêrîla li Çelê, Şemzînan û Lêlikanê lê da

Gerîlayên HPG'ê li Çelê, Şemzînanê û Lêlikanê ya Başûrê Kurdistanê li dijî hêzên dagirker ên dewleta Tirk çalakî kirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê got, "Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî hêzên me li dijî artêşa TC'ê ya dagirker çalakî kirin."
Di daxuyaniyê de bi berfirehî li ser çalakiyan hate gotin: "12'ê Hezîranê saet 13.30'an, li Çelê ya Colemêrgê li girê Kurşîno û geliyê Deştanê li dijî artêşa TC'ê ya dagirker hêzên me çalakî kirin. Di çalakiyê de mewziyên dijmin û stargehên wan derb xwarin, tam diyar nebû bê ka çend leşker hatin kuştin û çend



jê birîndar bûn. Piştî çalakiyên balafirên şer ên hêzên dagirker derdora gundê Bedehê bombe kirin."
"13'ê Hezîranê saet 15.00'an hêzên me li Şemzînanê ya Colemêrgê, di navbeyna Girê Çeta û Girê Şehîd Şevger de, ya li qada Serero li dijî yekîneyeke dijmin a dagirker çalakiyeke sabotajê kirin. Di vê çalakiyê de ji hêzên dagirker çend hatin kuştin û çend birîndar bûne diyar nebû.
Eynî rojê saet 15.50'î hêzên me li Başûrê Kurdistanê, li girê Lêlikanê ya herêma Bradostê ya Sidekanê li dijî leşkerên dijmin çalakiyek kirin. Di vê çalakiyê de derbên serketî li mewziyên dijmin ketin lê baş diyar nebû bê ka çend leşker hatin kuştin û çend birîndar bûn."
Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku artêşa Tirk 6'ê Hezîranê li Colemêrgê, li qadên Geliyê Marînos, Meza Marînos û Kato Marînosê operasyon daye destpêkirin û hate gotin, "Ev operasyon 12'ê Hezîranê bê encam bi dawî bûye."

## Em destûrê nadin axa me bê dagirkirin

Berdevkê Navenda Operasyonên Hevpar ên Iraqê Yehya Zubeydî ji Radyoya Dengê Amerîkayê re axivî û nerazîbûn nîşanî êrîşên dagirker ên Tirkiyê yên li ser Başûrê Kurdistanê da.
Zubeydî bal kişand ser hêzên artêşa Iraqê yên li Şengalê û hêzên pêşmergeyan ên li nêzî Qendîlê û diyar kir ku peywira van hêzan ev e ku sînor û serxwebûna axa Iraqê biparêzin.
Berdevkê Navenda Operasyonên Hevpar ên Iraqê Yehya Zubeydî got, "Hêzên me yên artêşê niha li Şengalê ne. Pêşmerge jî nêzî Qendîlê ne. Ev hêzên pergala parastina Iraqê ne. Peywira van hêzan ev e ku sînorên Iraqê û serxwebûna



wê biparêzin."
Zubeydî got, "Em ê destûrê nedin ku hêzên din axa Iraqê bi kar bînin. Me ev tişt gelek caran ji Tirkiyê re got. Me diyar kir ku em ê destûrê nedin ku hêzên din axa me dagir bikin."
Zubeydî diyar kir ku haya wî jê tuneye ku hêzên artêşa Tirk çûne gundê Bermizê û bi gel re civiyane.

## NY, pêşnûmeya ku Îsraîlê mehkûm dike pejirand



Neteweyên Yekbûyî (NY), pêşnûmeya ku Îsraîlê ji ber kuştina bi dehan kesî li Şerîda Xezayê mehkûm dike, pejirand.

Ji meha Adarê û vir ve, di xwepêşandanên bi navê "Meşa vegera mezin" de li ser sînorê Xeza û Îsraîlê bi dehan kes mirin.
Pêşnûme biryara ku pêşkêşî Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî hate kirin û Îsraîlê şermezar dike, bi dengê piraniya endaman hate qebûkirin. 120 ji 193 welatan destek dan pêşnûmeyê. Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) jî di nav de 9 welatan dengê 'Na' dan. Di dengdanê de 45 welat jî bê alî man.
Wekî din, pêşnûmeyeke din a ku ji aliyê DYA ve hate pêşkêşkirin û ji kuştina bi dehan kesî Hamasê berpirsyar nîşan dide, nehate qebûlkirin. DYA îdîa dike ku bûyerên li Xezayê ji ber Hamasê rû dane û Hamas berpirsyar e.

## Desteya hilbijartinê qebûl kir ku Demîrtaş tevlî mîtîngan bibe

Ji bo ku Namzetê Serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş karibe tevlî hin mîtîngan bibe, serlêdan hatibû kirin. Desteya hilbijartinê ev daxwaz qebûl kir. HDP'ê serî li Saziya Bilind a Hilbijartinê û li Wezaretê da.Ji bo ku namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş karibe tevlî mîtîngên li Stenbol, Dîlok, Îzmîr û Mêrdînê bibe serlêdan hatibû kirin. Ev serlêdan ji aliyê lijneyên hilbijartinê hatin qebûlkirin.
Ji bo ku Demîrtaş karibe tevlî van mîtîngan bibe serî li Desteya Bilind a Hilbijartinê û li Wezareta Edaletê



hate dayîn.Di daxwaznameyan de ev tişt hate gotin: "Ji bo ku Selaheddçn Demîrtaş karibe bi xwe tevlî mîtîngên li Stenbol, Dîlok, Îzmîr û Mêrdînê bibe serlêdan hatiye kirin. Heke biryara we berevajî be em dixwazin bi rêya SEGBÎS'ê tevlî mîtîngê bibe û nivîs ji cihê pêwist re were şandin."

## Partiyên Çep ên Swîsreyê piştgirî dan HDP'ê



Partiyên Çep ên li Swîsreyê, beriya hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiyê daxuyaniyek dan û piştgirî dan HDP'ê.

Nûnerên Partiyên Çep ên Swîsreyê û HDP'ê li bajarê Lozanê yê Swîsreyê di civînekê de li hev rûniştin. Ji Solidarite Jean Michel Dolivo, ji Partiya Karker-POP Vincent Keller, ji Partiya Keskan Illias Panchard û ji Partiya Sosyalîst Nicolas Rochat tevlî civînê bûn û destek dan HDP'ê. Partiyên Çep xwestin, namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş bê berdan.
Parlamentera Sêrtê ya HDP'yî Besîme Konca û Nûnerê HDP'ê yê Ewropayê Eyup Dorû jî tevlî civînê bûn.
Konca got, "Em partiyeke klasîk nînin. Partiyeke ku daxwaza azadiya jin û ciwanan dikin. Lewma êrîşên giran li me tên kirin. Li Tirkiyê demeke dirêj e ku faşîzm li ser mirovan tê ferzkirin."
Konca bi dewamî got, "Di vê hilbijartinê de jî bi pêşengiya CHP'ê feraseta neteweperestan li hev civiya. Li aliyê din jî tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê ava bû. Em jî weke gelên bindest xwe bi HDP'ê ji hilbijartinê re amade dikin. 7'ê Hezîranê HDP ji bendê derbas bû û pêşî li destpêkirina dîktatoriyê girt. Niha jî yekane partiya ku dikare vê bike HDP ye."
Nûnerên Partiyên Çep ên Swîsreyî jî destek dan HDP'ê û Demîrtaş.

## Fermandarê Îranî dewleta Tirk derewand



Berdevkê Hêzên Çekdarî yên Îranê Ebulfezil Şikarçî daxuyaniyek da û ragihand ku rêz dayîna serweriya welatên cîran ji bo Îranê pîvaneke û daxuyaniyên rayedarên Tirk ku dibêjin wê Îran ji bo operasyoneke li dijî Qendîlê hevkarî bike red kir.
Serokê rêjîma Tirkiyê Erdogan îdia kiribû ku wan dest bi operasyona Qendîlê kiriye û hinek rayedarên din yên Tirk jî ragihandibûn ku wan ji bo operasyoneke li dijî Qendîlê alîkarî ji Îranê xwestine.
Têkildarî vê mijarê Berdevkê Hêzên Çekdarî yên Îranê Ebulfezil Şikarçî daxuyaniyek da û diyar kir ku rêzgirtina li serweriya welatên cîran ji bo wan pîvaneke û got, "Hikûmeta Îranê bi bahaneya şerê dijî terorê tu carî serweriya welatekî din binpê nake."
Şikarçî her wiha li gotegotên dewleta Tirk ku dibêjin wê Îran jî tevlî operasyona li dijî Qendîlê bibe nerazîbûneke tund nîşanda û got ku ew van îddîayana red dikin.
Wezîrê Parastinê yê Tirkiye yê Nuredîn Canîklî diyar kiribû ku Îran û Tirkiye ji bo operasyoneke li dijî Qendîlê lihevkirine.



# Em xwedî li çanda xwe derkevin

***Endama Navenda Çandê ya Kevana Zêrîn a Kantona Kobanê Stêrvan Bozan diyar kir ku têkoşîna gelê Kurd ya ji bo parastina çandê planên qirkirinê vala derxist. Stêrvan got, "Niha jî dem dema xwedîdertina li çand û nasnameyê ye. Divê em ji her demê zêdetir xwedî li nirx û nasnameya xwe derkevin."***

Endama Navenda Çandê ya Kevana Zêrîn a Kantona Kobanê Stêrvan Bozan têkildarî êrîşên dewleta Tirk a li dijî çand û nasnameya Kurdan got: "Têkoşîna gelê Kurd a bi salan û xwedîderketina wan a li çand û axa xwe planên qirkirinê yên Erdogan û yên berî wî, vala derxist."
Endama Navenda Çandê ya Kevana Zêrîn a Kantona Kobanê Stêrvan Bozan derbarê qirkirina çandê û êrîşên li ser nasnameya gelê Kurd de diyar kir ku parastina çand, wêje, huner, dîrok û kevneşopiyê bingehek xurt a ji bo têkoşînê ava dike û got: "Gelê Kurd ji ber ku bi salan e ji bo çand, huner, wêje, dîrok û kevneşopiya xwe têdikoşin vê esas digirin loma nehişt ku neyar bi ser bikevin."
Stêrvan Bozan anî ziman ku xwedîderketina nasmeya neteweyî gelek girîng e û got: "Ji bo em planên qirkirina neyaran vala derxînin divê em di destpêkê de tiştên ku bingeha nasnameya neteweyî ava dike xwedî derkevin. Ev jî çand, huner, wêje, dîrok û kevneşopiya me ye. Îro li çar



parçeyên Kurdistanê êrîşek li dijî çand, huner, wêje, dîrok û kevneşopiya me heye. Mînaka vê yekê herî dawî me li Efrînê dît ku dewleta tirk û çeteyan çawa êrîşî peykerê Hesinkar Kawa û cihên dîrokî kir. Her wiha Erdogan dîsa li Bakurê Kurdistanê dest dirêjî nirxên gelê Kurd kir. Li Bazidê Peykerên Ehmedê Xanî hat hilweşandin li Sêrtê Pirtûkxaneya Celadet Elî Bedirxan hat valakirin. Li her derê êrîşek mezin li dijî nirx û nasnameya Kurdan heye. Loma divê em xwedî li nirx û nasnameya xwe derkevin."

### EM LI ÇANDÊ XWEDÎ DERKEVIN

Stêrvanê diyar kir ku divê hemû Kurd bêtir li çand û nasnameya xwe xwedî derkevin û wiha dewam kir: "Bi salane ku li her çar parçeyên Kurdistanê li dijî kurdan polîtîkayên qirkinê dikeve meriyetê. Lê gelê Kurd tu carî dev ji zimanê xwe berneda û xwedî li çand, huner, dîrok û kevneşopiyên xwe derketin. Niha jî dem dema xwedîdertina çand û nasnameyê ye. Divê em ji her demê zêdetir xwedî li nirx û nasnameya xwe derkevin."



Stêrvanê di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser Berxwedana Serdemê ya Efrînê û wiha got: "Gelê Efrînê bi têkoşîna xwe li dijî qirkirina çandê sekinînin û niha têkoşîna çand û hunera xwe li Kampên Şehbayê didin. Têkoşîna Gelê Efrînê sembola parastina çandê ye. Ev yek jî girêdana gelê Kurd a ji bo çand û nasnameya xwe derdixe holê. Têkoşîna ji bo çandê ya Gelê Kurd qirkirina li dijî Kurdan vala derxist. Loma divê em wekî gelê Kurd her dem têkoşîna xwe ya ji bo nirxên girîng ên ku nasnameya me ya neteweyî ava dikin, xwedî derkevin…

***JINNEWS***

## Hemû dîwanên Cegerxwîn hatin çap kirin




Weşanxaneya Lîsê ya ku ji sala 2004'an ve barê weşandina şahberhemên kurdîyê avêtiye ser milên xwe, xwestiye ji nû ve li dîwanên Seyda vegere û bi hûrbînî û şarezayî çapeke hêja ya sererastkirî raberî hezkerên helbesta kurdî bike. Ev çapa li ber destên we berhema kedeke dûrûdirêj a pisporane ye

Di mêjûya wêjeya kurdî de, seydayê nemir Cegerxwînê Hesarî cihekî taybet û nêvnas digire û her dem wekî helbestkarê gel e hem klasîk hem nûjenxwaz deng daye û cihê xwe di dil û hişê gelê xwe de xweş kiriye.
Di vê çapa nû ya berhemên helbestî yên Seydayê Cegerxwîn de, Weşanxaneya Lîsê ya ku ji sala 2004'an ve barê weşandina şahberhemên kurdîyê avêtiye ser milên xwe, xwestiye ji nû ve li dîwanên Seyda vegere û bi hûrbînî û şarezayî çapeke hêja ya sererastkirî raberî hezkerên helbesta kurdî bike.
Ev çapa li ber destên we berhema kedeke dûrûdirêj a pisporane ye.
Armanca sereke ya vê çapkirinê ew e ku dîwanên Seyda Cegerxwîn bi rengekî nûjen û xweşamadekirî werin raberkirin.
Çapa Lîsê ji du bergên mezin ên bedew û dilrevîn pêk tê ku qutîyeke rengîn wan hembêz dike. Cilda yekê bi serenavê "Ronahî Li Pey Tarî ye" û cilda duyem bi serenavê "Ji Min Dil Bir Bi Carek" e.
Lîsa ku her dem xwedî li pêşeng û nûjenxwazên wêjeya kurmancî/kurdî derketiye û xwe berdaye rêça dirêj a pêşvebirina wêje û çanda kurdan, vê carê bi çapkirina dîwanên Cegerxwînê Seydayê helbesta kurdî li pêşberî xwînerên xwe ye... da ku em jî wekî Cegerxwînê gewre "nûjen bin bi pîrî"… da ku em "guh bidin saza" cegerê xwe…

***AMED***


## Ma sînemaya te ji ya Yilmaz Guney çêtir e?



Havîna sala 2003´yan li bajarê Franseyê Rennesê mijara Festîvala Sînemayê kurd bûn. Di festîvalê de piştî nîşandana filmê xwe, Behman Qûbadî jî weke qiseker di panelekê de amade bû û behsa fîlma kurd û hunerê dikir. Dema ku behsa huner û sînemayê kir, bi îhtîmam îşaret pê kir ku ji bo hunerê, serxwebûna ji siyasetê girîng e û divê huner û sînema xwe dûrî siyasetê bidin û da nav. Heta gihîşt wê radeyê ku bibêje, lawaziya herî li pêş a sînemaya kurdî siyaset û siyasîbûn e. Lê axaftina wî kir ku wergêra hingê dev ji wergerê berde û jê re bibêje, naxwe tu dibêjî sînemaya te ji ya Yilmaz Guney çêtir e?
Bersiveke ku Behman Qûbadî bide vê pirse helbet nebû. Li aliyê din jî jixwe Qûbadî bixwe, êdî di çarçoveya Îranê de "tenê" filmên "siyasî" çêkirin. Lê niha ez li ser rêya mimeleya bi hunerê re weke tiştekî derveyî siyasetê dewam bikim. Li vir siyaset weke siyaseta bendê tê dîtin, ango ya partiyên siyasî. Mirov çavên xwe lê miç dike ku siyaset tiştekî ji bendan û wêde be. Ev têgihiştina li huner wisa dike ku carinan nexasim jî aliyên entelektuel kor bibin li rastiya hebûn, peydabûn û bipêşketina hunerê…

***Luqman Guldivê-Jêder-e-rojname***

## Em dikarin!



**Xelîl XEMGÎN**

Berê, mirovan serpêhatî û bûyerên girîng ji bîr nedikirin. Pirtûk û romanên dixwendin, di bîr û hizra xwe de jiber dikirin, ji helbest û stranên hezkirî, di giyanê xwe de, mîna pêdiviya vîtaminan diparastin! Ji bo paşeroja xwe, serpêhatî, bîranîn û bûyerên bihurî, mîna xelekên zincîran ji hevdu raqetandî nedikirin. Bîrokî û ji 'bîrkirin' êdî nexweşiya serdema teknolojî û 'dîjîtalî' ye!
Me bi dehan hejmarên telefonan di hişên xwe de ezbere (jiber) dikirin, rê û rêbaz, kolan û kuçeyên bajaran, mîna pêdiviyekê, me ji bîr nedikirin.
Hin caran min digot, herhal ji ber bandora koçberiyê, ji ber sedemên jiyana xerîbiyê ye ku mirov bîroke dibe û hafize lewaz dibe. Lê van salên dawiyê, êdî têgihiştim ku serdema 'teknolojî- dîjîtalî' tevî hemû nîmetên xwe ên erênî, rûyên xwe yê neyînî jî hene. Hêsanî, têgîniyên bê ked, ji milekî dinê ve tê wateya tembelî û lewaziya mêjî û hafizeya meriv. 'Serdema' ku cîhana mirovan bi qasî gundekî biçûk kiriye de, gelo tûrikê bîra me jî biçûk kiriye?... hema van 20 salên dawiyê em bînin bîra xwe. Ango bûyerên li welatê me qewimîn û diqewimin, mîna ku ji xafila mirovan tê. Em wekî civak jî, xuya ye, em ji bo xafilbûn û jibîrkirinê re, hinekî vekirî ne!
Ger mirov bîra xwe herdem teze û nû neke, her wiha, xemxwariyên xwe ên bîrdozî lewaz û sist dike! Bêguman, hişmendiya rentekar û manfeetperst jî, wê li hawirdora meriv bi pêşkeve!. Îca 'postmodernizma' ku dibêje: em zarokên îro ne, me çi ji duh ye! Mixabin, dê bibe mînaka herî sosret.
Em bînin bîra hev. Berî çil salan, cendirmeyekî an memûrekî dewletê, an jî ajanekî pergalê, hikûmdarê li ser civaka me bû. Lê îro şansekî van pergalan wisa heye, ku civaka me bi cendirmeyekî an ajanekî kontrol bike? Berî bîst salan, ango di pêvajoya esareta Rêberê Gelê Kurd de, travma gelê me kişand, dagirkeran bi şerê psîkolojîk êrîş mêjiyên civakê dikirin! Da ku bîr û baweriyê bişkînin. Di wê serdemê de, gelek kesan bawer kirin ku êdî tevgera azadiya gelê kurd têk çûye. Lê îro? Ka kî têkçûye?
Di qada têkoşîna civakî de, ji destpêka salên 1990'an û heya niha, fêlbaziyên vê pergala zalimkar û dagirker, heger meriv mîna fîlmekî 'kevneşop' temaşe bike, hûn ê bînin bîra xwe ku ji serî û heya dawiya ev fîlma sosret, hemû konseptên çewisandina vîn û hêviyên civakê ne. Ji kuştin û zindankirina parlementeran, ji hemleyên JÎTEM'ê ta bûyerên faîlên wan diyar, ji konseptên'operasiyonên KCK'ê' ta destdayîn û xespkirina şaredariyan. Bi kurtî, li hemberî her hewldaneke civaka sîvîl, dewletê bi hovîtî êrîşên xwe berdewam kirine! Bi tecrîd û dîlgirtinê, siyasetmedarên kurd û qada sivîl kiriye armanca çewisandin û tundîyê. Îca bi pêşketina şoreşa Rojava re, çavsoriya vê pergalê êdî hişmendiya xwe ya li dijî gelê kurd, bi dagirkirina Efrînê re, bi temamî hatiye aşkerakirin. Bêguman, dîlgirtina birêz Selahattîn Demîrtaş jî, êdî ne tenê gelê kurd, her wiha hemû cîhan jî, îro dizane ku ev pergala neyartiya gelê kurd dike.
Niha gelê me li bakur di pêvajoyek dîrokî de ye, di nav tekoşînek bêhempa de ye, li beşên din jî, piraniya gelê kurd di nava hêvî û bendewariyekê de ne.
Îro, di tevnên civakî de, min temaşe û guhdariya Dayîkekê li Amedê kir!
Bawerim, hemu xame, nivîs, gotar û bangewazî, li ber hewildanên vê dayikê nikarin xwe bînin ziman. Dayîkek bi temenê xwe mezin, bi wêneyê Selahattîn Demîrtaş û ala HDP'ê, kolan bi kolan digere, stranên hîsî û wîjdanê distrîne, helbestên xîret û mirovahiyê dixwîne. Pêwîste her kesek ji me, jin, mêr, keç û xort, em ji wijdan û xîreta xwe lêpirsînekê vekin! Da ku em vê pêvajoya dîrokî veguhezin firsendekê ji bo biratiya gelan, ji bo aştî û aramiya hemû gelan. Em hene, Em DIKARIN!...

***Jêder-e-rojname***

# KNK'ê Cejna Remezanê pîroz kir


***Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNK'ê peyamek weşand û cejna remezanê pîroz kir. KNK'ê got, "Mixabin em dîsa cejnekê, di rewşeke aloz de pîroz dikin. Li Bakur, li Rojava û Başûrê Kurdistanê êrîşên qirkirinê li ser gelê me didomin. Em di wê baweriyê de ne ku gelê me, wê di demeke nêz de bi aramî û azad, cejnên xwe pîroz bike."***

KNK'ê Cejna Remezanê li gelê Kurd û alema Îslamê pîroz kir.
Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) bi wesîleya Cejna Remezanê peyamek weşand.
Di peyamê de hate gotin, "Sibê cejna Remezanê ye. Mixabin em dîsa cejnekê, di rewşeke aloz de pîroz dikin. Li Bakur, li Rojava û Başûrê Kurdistanê êrîşên qirkirinê li ser gelê me didomin. Dewleta Tirk piştî dagirkirina Efrînê niha jî berê xwe daye Başûrê Kurdistanê. Li Rojhilat jî rewşa aloz berdewame. Li hember êrîşên dagirkeran, berxwedanek bê hempa heye û şerê azadiyê û berxwedana gelê me, bi her awayî berdewam dikin."
KNK'ê diyar kir ku di pîrozkirina Cejna Remezanê de, sosret ew e ku yên êrîşa dajon ser gelê Kurd, ne bi tenê xwe misilman didin xuya kirin, xwe serok-rêberên misilmanan didin nîşandan. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Roja cejnê jî, wê dîsa derkevin ber kamerayên televizyonan û bi derewan bêjin 'misilmanên qenc û xêrxwaz em in' û bixwazin zalimtiya li ser




gelê me didin meşandin bidin vaşartin.
Bêguman li her çar perçeyan û her derê gelê me, êdî ne gelê berê ye, bûye xwedî hişmendiyeke mezin û di nava tekoşineke netewayî ya demokratîk a hemdemî de ye. Êdî ne xwazokê ber deriyê zalima ye û nema bindestiyê qebûl dike. Êdî bi tenê hêviya xwe bi xwe û rêberê xwe û tekoşerên xwe dike."
Di dawiya peyama KNK'ê de wiha hate gotin: "Em bi hêvî û di wê baweriyê de ne ku gelê me, wê di demeke nêz de bi aramî û aştî û azad, cejnên xwe û şahiyên xwe pîroz bike. Bi vê munasebetê em cejna Remezanê, di serî de li girtî û şervanên azadiyê, li gelê Kurdistanê û li alema Îslamê pîroz dikin."


## Divê cejn bibe wesîleya hesab pirsînê



Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA GEL bi wesîleya Cejna Remezanê peyam da û bang li her kesî kir ku xwe ji AKP'ê vegirin.
Di peyama KONGRA GEL de hate gotin, "Em Cejna Remezanê li gelê me yê li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat dijîn, li temamiya alema Îslamê pîroz dikin. Em hêvîdar in ku cejn ji bo piştgiriya neteweyî û civakî ya gelê me bibe wesîle."
KONGRA GEL diyar kir ku di nava şert û mercên giran de ew cejna îsal pêşwazî dikin û wiha dewam kir: "Rêber Apo cejneke din di nava şert û mercên giran ên tecrîdê de pêşwazî dike. Ji 11'ê Îlona 2016'an û vir ve, yanî bû salek û neh meh bi ti awayî em agahiyê ji Rêber Apo nagirin. Ji ber dagirkeriya Erdogan û çeteyên wî beşeke mezin a gelê Efrînê di nava rewşeke gelekî giran de, beşa din jî li Şehbayê di kampan de bi zor û zehmetî cejnê pêşwazî dikin. Parlamenter û hevşaredarên ku bi vîna gelê me hatine hilbijartin, rojnamevan, rewşenbîr û bi hezaran siyasetmedarên ji aliyê faşîzma AKP-MHP'ê ve dîl hatine girtin, li zindanê cejnê pêşwazî dikin.
Ev cejn di nava şert û mercên giran ên Rewşa Awarte de tê pêşwazîkirin. Ji bo cejn bibe wesîleya piştevanî û yekîtiya neteweyî û civakî ya gelê me, divê hemû welatparêz û mirovên têgihiştî bi xurtî bixebitin. Li dijî faşîzma AKP-MHP'ê divê mûxalefeta neteweyî û civakî bi rêxistin bikin."
KONGRA GEL bi bîr xist ku Cejna Remezanê di rojên dawî yên karê hilbijartinê de tê pêşwazîkirin û got, "Ji ber vê yekê, di serdan û pîrozbahiyên cejnê de, wê bi taybetî girîngiya vê hilbijartinê ji bo gelê me bê nirxandin."
Di dewama daxuyaniya KONGRA GEL de hate gotin, "Zilm û komkujiyên ku desthilatdariya faşîst û dijminê mirovan Erdogan-Bahçelî ya li Kurdan û mirovahiyê kiriye, di bîra gelê me de ne. Divê Cejna Remezanê bibe wesîleya hesabpirsîn û rêxistinbûna gelê me ya li dijî van kujerên dijminê Kurdan.

## Divê cejn bibe wesîla heskirin û wekheviyê

Hevserokê Yekîtiya Oldaran a Herêma Cizîrê Mele Mihemed Xerzî, diyar kir kesên ku olê ji bo berjewendiyên desthilatdariyê bikartînin wateya meha Remezanê li gor xwe guherîne.
Hevserokê Yekîtiya Oldaran a Herêma Cizîrê Mihemed Xerzî, li ser giringî û wateya meha Remezanê axivî û diyar kir ku mirov di meha Remezanê de nêzîkî xwestekên xuda dibe. Xwestekên xuda jî ji bo mirov ewe ku bi wekhevî, edaletî û heskirin bijîn. Cudahiya mirovan ji hev nebe. Çi netew, çi bawerî û çi mirov be divê xwedî maf û wekheviyê be.
Mele Xerzî balkişand ser rewşa cîhana Îslamê û anî ziman ku di roja îro de misilman dûrî wateya meha Remezanê bûne û got; "Tenê hersalê mehekî xwe dûrî xwarinê dikin û dibêjin elhemdûlîlah me rojiya xwe girt û xilas. Wek barekî li milê xwe dibînin. Lê heqîqeta rojiyê ne ev e. Di temamî îbadetên ku Îslam li ser disekine de, çawa mirov dikare xwe sinor bike û perwerde bike."
Mele Xerzî destnîşan kir ku ev hezar û çarsed sal in hişê misilmanan li serê wa venegeriya ye û wiha got; "Niha çekên pir giran ku kesek dikare di rojekî de bi sedhezaran kes bikuje ketiye nava gelê misilman. Em dibînin



çanda misilmanan û ragihandina misilmanan yek daxuyaniyek ku nêrînekî biratî, wekhevî û aştî di nav de hebe ranagihîne."
Mele Xerzî diyar kir ku wan dixwest Remezana îsal di nava cîhana misilmanan de wekhevî û aştî hebe û got; "Me dixwest misilman li hev rûnin û li ser pirsgirêkan bi wekhevî û aştîyane li hevbikin. Lê mixabin ev nebû."
Mele Xerzî dagirkirina Efrînê mînak da û wiha axivî; "Li gelek mizgeftên Tirkan meleyan Qur'an dixwendin û ji bo dagirkirina Efrînê fitwe didan. Melayên wan ji bo dagirkirinê cilên leşkeri li xwe dikirin, diçûn ser sinor û dua dikirin. Ev dide nişandan ku misilman çiqas dûrî olê xwe ketine û ne dîndarin. Mafyayên heşîş û efyonê van karan nakin. Van kesan bi fetweyên xwe karên qirêj kirin. Van kesên wisanmeha Remezanê li gor mirovên xirab guherîn."…
*ANHA*

## Rizgarkirina Efrînê cejna herî mezin e



Cejna Remezanê nêzîk dibe, lê şêniyên Efrînê ji ber dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê, cejna remezanê li kampê pîroz dikin. Gelên musliman cejna remezanê pîroz dikin. Di cejnê de zarok bi kirîna cilên nû kêfxweş û dilşad dibin.
Şêniyên Efrînê îsal, Cejna Remezanê dûrî warên xwe pîroz dikin. Şêniyên Efrînê di bin şert û mercên zehmet de li berxwe didin û diyar dikin ku rizgarkirin û vegera Efrînê cejna herî mezin e.
Zaroka bi navê Rama Mihemed got: "Ji ber destwerdana dewleta Tirk li ser Efrînê, em neçar man ku cejnê beyî amadekarî pêşwazî bikin û ji ber rewşa aborî em nikarin cil û lîstokên nû bikirin".



Dayîka Neîma jî wiha got: "Cejna Remezanê cejna aştî û dilovaniyê ye, lê artêşa Tirk wateya cejnê ya pîroz guhert û em neçar man ku li kampê cejnê pîroz bikin".
Apê Henan Xelîl jî bi bîr xist ku şêniyên Efrînê ji bo cejnê bi keyfxweşî amadekariyên berfireh dikirin, lê dagirketiya Tirkiyê kêfxweşî têk bir. Apê Henan got, "vegera li Efrînê ceja herî mezin e."…*ANHA*

## Hesekê xwe ji cejnê re amade dike



Şêniyên bajarê Hesekê xwe ji bo pêşwazîkirina cejna Remezanê amade dikin.
Bi boneya hatina cejna Remezanê li sûkên Hesekê tevger zêde bûye. Şêniyên bajar berê xwe didin sûkan û pêdiviyên cejnê dikirin.
Şêniyên bajarê Hesekê bi hatina cejnê kêfxweşiya xwe anîn ziman.
Cilfiroşê bi navê Elî Sultan diyar kir ku hewaya cejnê pir xweş e û da zanîn ku bi saya cejnê liv û tevger li sûkan zêde bûye. Her wiha Elî diyar kir ku şêniyên bajar pêwîstiyên xwe ji bo cejnê dikirin û hemû alav erzan in.
Ciwanê bi navê Hîmen Cîhad diyar kir ku wan wekî salên berê xwe ji cejnê re amade kiriye, ji ber ku li herêmê ewlehî û aramî heye…
*ANHA*

## HSK'ê alîkarî şand ji Efrîn û Bakurê Kurdistanê re

Heyva Sor a Kurdistanê (HSK) di çarçoveya kampanyaya fitre û zekatan de nêzî 260 hezar eûro alîkariya maddî şand ji Efrîn û Bakurê Kurdistanê re.
Heyva Sor a Kurdistanê bi wesîleya meha Remezanê di çarçoveya kampanyaya fitre û zekatan alîkarî kom kir. Heyva Sor a Kurdistanê 60 hezar eûro şand ji gelê Efrînê yên ku ji ber êrîşan li herêma Şehbayê bi cih bûne. Heyva Sor a Kurdistanê 200 hezar eûro jî şand ji gelên Sûr, Cizîr, Şirnex, Silopî, Hezex, Nisêbîn û Geverê yên ku dewleta Tirk ev bajar hilweşandibû.
Di daxuyaniya Heyva Sor a Kurdistanê de hate diyarkirin ku piştî payîza sala 2015'an li Gimgim,



Silopî, Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Dêrik, Kerboran, Hezex, Gever û Şirnexê li dijî gelê Kurd ê sivîl êrîş hatin kirin û bi sedan sivîl di van êrîşên dewletê de hatin qetilkirin. Di heman demê de bi tankan bi hezaran mal hatin rûxandin û bi sed hezaran kes ji neçarî koç kirin.
Hate diyarkirin ku dewleta Tirk a dagirker di 20'ê Çileya 2018'an de jî êrîşî herêma Efrînê kir û ji ber van êrîşan bi sed hezaran gelên Efrînê berê xwe dan herêma Şehbayê û di şertên giran de dijîn.
Heyva Sor a Kurdistanê di dûmahîka daxuyaniya xwe ya Cejna Remezanê ya hemû bawermendan pîroz kir û spasiya hemû kesan kir ên ku alîkarî dane kampanyayên wan.



# 30 jinên ciwan tev li YPJ`ê bûn

***Jinên bakurê Sûriyê kom bi kom beşdarî xebatên parastinê dibin. Jin li Rojava û bakurê Sûriyê di bin pêşengiya YPJ'ê de di warê parastinê de bi roleke girîng radibin. 30 jinên ciwan piştî ku dewreya perwerdeyê li Akademiya Şehîd Rojda a bajarê Minbicê bi dawî kirin, tev li nava refên YPJ`ê bûn.***



30 jinên ciwan piştî ku dewreya perwerdeyê li Akademiya Şehîd Rojda a bajarê Minbicê bi dawî kirin, tev li nava refên YPJ`ê bûn.
Akademiya Leşkerî ya Şehîd Rojda ya navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî ya herêma Firatê, dewreya xwe ya 5`mîn bi navê Şehîd Mariya Sîpan bi dawî kir.
Dewre bi tevlêbûna 30 jinên ciwan ji pêkhateyên Kurd û Ereb hatibû destpêkirin. Dewreyê 45 rojan dewam kir. Di dewreyê de li ser gelek mijarên cuda ders hatin dayîn.
Fermandarên YPJ`ê û endamên QSD`ê beşdarî merasîma bidawîkirina dewreyê bûn.
Di merasîmê de yek ji fermandarên YPJ`ê Şîlan Silêman axivî û bidawîbûna dewreyê li hemû şervanên YPJ`ê pîroz kir.
Şîlan di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku tiştekî pir girîng e ku jin tev li YPJ`ê bibin û rastiya xwe nas bikin û wiha dewam kir: "Bi tevlêbûna jinan a nav YPJ`ê re ne tenê rastiya xwe nas dikin lê belê kesayeta wan xurt dibe û dikarin li hemberî zilm û zorê parastina hemû jinan bikin."
Şîlan di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku divê hemû şervanên ku tev li dewreyê bûne erka xwe li hemberî welatê xwe pêk bînin û parastina welat li hemberî hemû êrîşên derve bikin.
Di dawiyê de şervanên ku dewreya perwerdeyê bi dawî kir, soza leşkerî da…*ANHA*

## Bila ev cejn bibe cejna azadiyê



Hevseroka Meclisa Damezrîner a Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyê Hediye Yusuf peyama cejnê da û got: "Bila ev cejn bibe cejna azadî, aştî û demokrasiyê."
Hevseroka Meclisa Damezrîner a Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyê Hediye Yusuf , Cejna Ramazanê ya Gelên Sûriyê pîroz kir û peyama yekitî û biheverebûnê da.
Hediye di peyama xwe de diyar kir ku gelên Sûriyê û yê bakurê Sûriyê bi salan bi şer re rûbirû hatine hiştin. Herwiha Hediye bi bîr xist ku di şerê hat kirin de bi hezaran kes hatin qetilkirin, bi sendan kes hatin revandin û bi milyonan kes jî hat koçberkirin.
Hediye di berdewama peyama xwe de ev tişt got: "Gelek herêmên Sûriyê niha di bin dagirkeriya AKP'ê û komên girêdayî wê de ne. Gelê me di bin dagirkeriyê de hewl dide ku jiyana xwe berdewam bike. Bi taybetî jî gelê Efrînê li ger dagirkerî û êrîşan hewl dide ku bijî. Bi sedan Efrîniyên ku ji ber şer hatin koçberkirin li Kampa Serdem û Berxwedanê yên li Şahbayê li gel gelek zametiyan têkoşîna jiyanê didin. Gelê me hîna li hêviya ku vegre Efrîna ku bê azadkirin e. Li gel hemû êşan jî wê gelê me li gorî kevneşopiyên xwe Cejna Remezanê pîroz bike. Em jî hêvî dikin ku ev cejn bibe cejna azadî, aştî û demokrasiyê. Ez bi van hestan cejna hemû gelên li Rojhilata Navîn û Gelên Sûriyê pîroz dikim."

## Erdogan wê têk biçe



Cîgira Desteya Têkiliyên Derve ya Herêma Efrînê Cîhan Mihemed derbarê hilbijartinên ku wê di 24'ê Hezîranê de li Tirkiyê çê bibe û derbarê pergala ku Erdogan li Tirkiyê ava kiriye diyar kir ku bi pergala yekperest demokrasî nayê avakirin û got: "Siyaset û pergala ku dewleta tirk bi salane dide meşandin her dem nasnameya gelê Kurd hedef girtiye û gelê kurd qetil kiriye. Divê gelê Kurd ji bo hilbijartina 24'ê Hezîranê bibin yek û li dijî pergala ku gelê Kurd hedef digire bisekinin."
Cîgira Desteya Têkiliyên Derve ya Herêma Efrînê Cîhan Mihemed derbarê hilbijartinên ku dê di 24'ê Hezîranê de li Tirkiyeyê çê bibe û derbarê pergala ku Erdogan li Tirkiyê ava kiriye anî ziman ku her dem ji aliyê îktidara AKP'ê û yên berî wê destkeftiyên gelê Kurd hedef hatine girtin û got: "Divê em wekî gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê li destkeftiyên xwe xwedî derkevin û di hilbijartina 24'ê Hezîranê de xwedî li sindoq û vîna xwe derkevin."
Cîhan Mihemed da zanîn ku Erdogan ji bo gelê Kurd ji hev qut bike û têk bibe êrîşî Efrînê kir û got: "Dema ku gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê çûn ser sindoqan divê êrîşên Erdogan ên li dijî Efrînê ji bîr nekin. Erdogan di şexsê Efrînê de êrîşê gelên Kurd ên çar parçeyên Kurdistanê kir. Divê em wekî gelê Kurd ên çar parçeyan bibin yek û li dijî êrîş û qirkirina dagirkeran derkevin."

### ÊRÎŞÎ VÎNA GELÊ KURD KIRIN

Cîhanê anî ziman ku hêzên navneteweyî û Erdogan bûn yek û êrîşî vîna gelê Kurd kirin û wiha dewam kir: "Ji bo dagirkirina Efrînê Tirkiye, Rûsya, Îran, Amerîka bûn yek û êrîşî nirx û vîna gelê Kurd kirin. Hêzen Navneteweyî û Erdogan di şexsê Efrînê de nirx û vîna gelê Kurd ê li ser çar parçeyên Kurdistanê hedef girtin. Niha jî di mijara Minbicê de Amerika û Tirkiye bûn yek. Loma divê gelê Kurd van bûyerana baş bixwînin û ji bo Erdogan li ser Rojhilata Navîn diktatoriya xwe berdewam neke divê em hêza xwe bikin yek û li ser her çar parçeyan têbikoşin."
Cîhanê bi lêv kir ku dê Erdogan bi yekîtiya Gelê Kurd têk biçe û wiha dawî li axaftina xwe anî:"Bila Erdogan û yên ku tevî wî tev digerin baş bizanibin ku gelê Kurd dê li ser xeta azadî, aştî û têkoşînê berxwedana xwe bidomîne û nehêle ku Erdogan bi ser bikeve."…*JINNEWS*

## Jin aboriya xwe geş dikin

Kooperatîfa Jinan a Kongreya Star a li Kobanê berhemên xwe yên çandiniyê, kom dikin.
Jinên Kobanê bi keda destên xwe aboriya xwe geş dikin û li ser piyên xwe dimînin.
Kooperatîfa Jinan a Kongreya Star a li Kobanê di çarçoveya pêşketina aboriya jinê de berhemên xwe yên çandiniyê, kom dikin.
Endama Kooperatîfa Jinan a Kongreya Starê Guljîn Qadir derbarê pêşketina aboriya jinê de axivî û got:"Em wekî endamên Kongreya Starê hewl didin ku jin di warê aboriyê de xwe pêş bixin û li ser lingên xwe bisekinin. Ji bo pêşketina civakê azadiya jinê ya di aboriyê de girîng e. Loma em hem ji bo jinê hem jî ji bo civakê hewl didin…*JINNEWS*



## Parêzvana mafên mirovan a Îranî hate girtin

Parêzvana mafên mirovan û parêzera Îranî Nesrîn Sotudeh ku Xelata Sakharovê girtiye, ji aliyê rejîmê ve hate girtin.
Hevserê wê Reza Kahndan bi rêya medya civakî ragihand ku xwediyê xelata Sakharovê Nesrîn Sotudeh hatiye girtin.
Reza Khandan ragihand ku parêzvana mafên mirovan û parêzera 55 salî roja 13 hezîranê hate destgîrkirin û piştre hate girtin. Khandan diyar kir ku hêzên rejîmê hevsera wê birine Girtîgeha Evîn a li Tehranê û ji bo girtina wê jî cezayê girtîgehê yê 5 salan hincet nîşan dane.
Lê tê gotin ku li ser cezayê girtîgehê yê li Nesrîn Sotudeh hatiye birîn, agahî jê re nehatiye dayin.
Nesrîn Sotudeh dema dawî jinên ku ji ber serê xwe nenixumandine doz lê hatine vekirin, diparêze.



Rêxistina Efûyê ya Navnetewyî (AI) girtina Sotudeh bi zimanekî tund şermezar kir.



## Bûhişta Cîhanê

Binevş SARYA

Şunwarên Kurdan, bingeha jiyanê, buhişta Cîhana me, ciyên jiyanê ye. Hilala zêrîn binarên Zagiroz û Torosan. Cihê ku heri zêde Kurd parastine û buye ciyê îlhama jiyanê bêguman çiyane. Ji ber wê ji Kurdanra çiya xwedî ciyeki biwatene û hebuna jiyanê ji mirovanra ava dikin. Di destipêka ava buna civakê da jî mirovan xwe li ciyên asê girtine û li wan deveran bi awayek ewlehî karîne jiyan bikin. Di aqilê civakê yê destipêkêda jî baş hatiye zanînîn ku dema li ciyekî bi ewle nebin wê nikaribin hebuna xwe bidomînin. Çawan ku Gerduna me xwe li ser 3'ê ajoyan dide jiyin bêguman civak an ji hemu zindi ji liser 3'ê ajoyan hebuyina xwe didin domandin. Ajoya ku ji hemû zindiyanra xala bingehîn a jiyanê ye. Ajoya xwe parastinêye. Dema ku tu xwe neparêzî tuyê nikaribî hebuna xwe bidomînî. Ji boyî jiyanek baş û bi wate beriya her tiştî parastinek bi zanisti ji mirovanra pêwîste. Ji boyî jiyanek bi ewle Kurdan berêxwe daye çiyan û li buhişta Cîhanê yanî li qadên çiyan de jiyan kirine. Di roja îrode jî ji boyî jiyanek bi wete û hebuyîna gelê Kurdi zarokên wan berê xwe didin bûhişta Cihanê û li wian qadên pîroz hebunê didin domandin.Hêzên destihiladar baş dizanin ku hebuna li çiyan ji destihladariya wanra tehlîkeya herî mezine û hebuna li çiyan tirs û xofek mezin dixe nava dilê destihladaran. Ji ber wê êrîşên li ser çiyan her ku diçe zêdetir dikin û dixwazin ku jiyanê li çiyan bîdin tune kirin. Dewleta dagirker Turkiye di serîda xwesti ku Kurdan di bajaranda bide tune kirin û bi her awayê hovane êrîşî ser bajarên kurda kir. Gelek bajarên Kurdan talan û xerabî kirin. Ji ciyên herî kevnar ên Kurdanava daesti bi talan kirinê kirin. Ji Cizîr hetanî Afrînê talan û zilma xwe dan domandin. Bî her awayê zulmê nekarî vîn û hebuna gelê Kurdi bide tune kirin. Vê carê jî berê xwe da qadên parastina mediya. Di demê hilbijartinên Bakurê Kurdistanê da armanca dagirkirina qadên parastina mediya ne rewşek ji rêzêye. Ji xwe tu awayaî şer an ji talan nabin rewşên ji rêzê. Pilana dagir keriya yên li ser qadên parastî ên mediya yê ev 3'ê salin ku di rojevêde ye. Piştî 3'ê salan biryara talanê, niha di dema rewşa awarte ya li Bakurê Kurdistan, talana li herêma Afrîn, hatina qayûman ên li ser wazifana, tecirîta giran kirî a li ser birêz Abdullah OCELAN û bi awayek pêşwaxit çuyina hlbijartinên parlemet û serok komartiyê ku gelek siyastimedar û parlemetên Kurdi di girtî gehandene ne xalek ji rêzêye ku di demek wihada êrîşî herêmên mediya dikin. Ev rewş wê dide diyarkirin ku diktetor Erdoxan di tirsa tunebuna xwedaye. Ji xwe gotinek pêşiyan wiha heye dibêjin ''dem ku gur birçî dibe êrîş dike'' di vê rewşê da wiha diyere ku destihiladar Erdoxan birçiyê miran xweye ku ewqas bi awayek hovane êrîşi hemu deskeftî û hebuna gelê Kurdi dike. Lê belê ev rewş wê dide diyarkirn ku wê hebuna destihladariya diktetor Erdoxan pir demdirêji nebe. Ji salên 70 hetanî niha dewleta Turk dibêje emê Kurdan tune bikin lê belê hetanî niha bi tu awayî destihladaran nekariye gelê Kurd tune bikin wê ji naha û pêda jî tu hêz nikaribin gelê Kurdi tune bikin. Çawan ji destipêkirina civakan va heya niha çiya bune ciyê parastina mirovahiyê wê ji niha û peda ji cardin çiya bibin ciyê parastî ya gelan. Çiya warên parstî yên Kurdanin û wê wisan ji bidome. Tu kes nikare ewladê dê ji cigera wê derîne. Çiya dayîka Kurdane û ciyê hebuna jiyanêye.

# Divê pêşî li dagirkeriya Tirk were girtin

***Parlamenterê Tevgera Goran yê başûrê Kurdistanê Ebdulreman Elî diyar kir ku kiryarên dewleta Tirk hemû sînor derbas kirine û gihiştiye asta dagirkeriyê û got; "Eger pêşiya vê dagirkeriyê neyê girtin, wê metirsiya dagirkirina Kerkûk, Silêmanî û herêmên din jî pêk were."***




Parlamenterê Tevgera Goran yê başûrê Kurdistanê Ebdulreman Elî diyar kir ku kiryarên dewleta Tirk hemû sînor derbas kirine û gihiştiye asta dagirkeriyê û got; "Eger pêşiya vê dagirkeriyê negirîn, wê metirsiya dagirkirina Kerkûk, Silêmanî û herêmên din çêbibe."
Parlamenterê Tevgera Goran Ebdulreman Elî diyar kir ku asta kiryarên dewleta Tirk gihiştiye dagirkeriyê û got; "Kiryarên dewleta Tirk hemû sînor derbas kirine û gihiştiye asta dagirkeriyê, lê mixabin, berpirsên Herêma Kurdistanê û hikûmeta Iraqê bêdengin. Eger pêşî li vê dagirkeriyê neyê girtin, ez dur nabînim, metirsiya dagirkirina Kerkûk, Silêmanî û herêmên din jî heye."
Elî diyar kir ku ji serokatiya parlamentoyê xwestine derbarê dagirkeriya dewleta Tirk de rûniştinek pêk were, lê bersiv nedaye û got; "Weke hejmarek parlamenter me daxwaznameyek pêşkêşî piraniya konsolosxane, sefîrên welatan, saziyan, rêxistinên navneteweyî û palamentoya Iraqê kir. Me ji wan xwest ku demildest dengê xwe derbixin li ser vê dagirkeriyê. Herwiha me daxwaz ji Desteya Serokatiya Parlamentoya Herêma Kurdistanê kir ku rûniştinekî neasayî pêk bîne, lê bersiva me nebû."
Parlamenterê Tevgera Goran yê başûrê Kurdistanê Ebdulreman Elî di dawiyê de wiha got; "Bêdengiya parlamentoyê û hikûmeta Herêma Kurdistanê ya li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk, wê rewşên xirab bi xwe re bîne. Desteya Serokatiya Parlamentoya Herêma Kurdistanê berpirsên pêk neanîna rûniştina parlamentoyê ya li ser dagirkeriya dewleta Tirk e. Ev Desteya Serokatiya Parlamentoyê nexwedî asta berpirsyartiyê ye."… ***ROJNEWS***

## Emê hesabê yek bi yek bipirsin





Rêveberiya HDP'ê bal kişand ser fermanên Erdogan ên li ser Demîrtaş dide dadgerî û YSK'ê û diyar kir ku ev yek sûc e.
Desteya Rêveberiya Navendî ya Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê, bi sernavê "Serokkomar sûc dike, Dadgeha Destûra Bingehîn jî hiqûqê binpê dike" daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de hate gotin, binpêkirina hiqûqê, sûc û bêûsûlî di dema hilbijartinê de dewam dikin. Daxuyanî wiha ye: "Derbarê namzetê me yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş, 29'ê Gulana 2018'an serî li Dadgeha Destûra Bingehîn hate dayin. Dadgehê, roja ku serlêdan hate kirin biryar da ku li gorî xala 73'an a rêziknameya navxweyî serlêdan neyê qebûlkirin. Lê tiştekî ecêb e; ji bo Birêz Selaheddîn Demîrtaş me li gorî xala 73'an a rêziknameya navxweyî tiştek nexwestine. Daxwaza me ew e ku li gorî xala 68'an a rêziknameya navxweyî, serlêdan zû bê nirxandin. Dadgeha Destûra Bingehîn bêyî ku dosyayê lêkolîn bike, li ser daxwazeke nehatiye kirin biryar daye. Ev yek jî nîşan dide ku dadgeh li gorî fermanê biryarê didin. Ne xema Dadgeha Destûra Bingehîn e ku vê bêhiqûqiya xwe binixumîne. Eşkere nîşan dide ku li gorî fermanê tevdigere. Dadgeha Destûra Bingehîn mixabin bûye dîwana bilind a binpêkirin û bêhiqûqiyê."
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin ku Serokê AKP'ê Erdogan bi navê Serokkomariyê mohra xwe datîne binê mijarên ku eleqeya xwe pê re nîne.
Daxuyaniyê wiha dewam kir: "Ji bo namzetê me Demîrtaş nikaribe di çarçoveya mafê xwe yê hilbijartinê yê serbest de bixebite, bi rengekî vekirî fermanê dide gelek saziyan. Serokê Giştî yê AKP'ê Erdogan di bernameya televîzyonekê de li xwe mikur hat ku wî ferman daye YSK. Erdogan diyar kir ku wî agahî daye YSK'ê û jê re gotiye, axaftina propagandayê ya ku TRT'ê bi Demîrtaş re kişandiye, piştî ku ji aliyê wî ve hate kontrolkirin dikare bê weşandin.
Namzetek li ser axaftina namzetekî din biryarê dide. Ev rewşeke sosret û bêhiqûqî ye ku li cihekî din ê dinyayê nehatiye dîtin. Destwerdana li hilbijartinê ye, sûc e.
Serokê Giştî yê AKP'ê ku li gel her tiştî jî fêhm kiriye wê encama dixwaze nikaribe bi dest bixe, fermanê dide hemû saziyên dewletê û bi vî rengî dixwaze di hilbijartinê de bi ser bikeve. Li pey hev sûcan dike. Ne karê YSK'ê ye ku şert û mercê hilbijartinê ji bo bi kêrî namzetekî bê bi guherîne. Wezîfeya YSK'ê ew e ku hilbijartinekê amade bike ji bo îradeya gel bi xurtî bandorê li sindoqan bike. Em ê giliyê her sûcî bikin û di çarçoveya hiqûq û demokrasiyê de em ê hesabê wan yek bi yek bipirsin."

## Divê Kurd li dijî dagirkeriyê bibin yek

Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanê û Partiya Demokratîk a Kurdên Sûriyê PDKS'ê bi daxuyaniyên cûda bang li hikûmetên Hewlêr û Bexdayê kirin ku bi berpirsyariyên xwe rabin û li dijî dagirkeriya artêşa Tirkiyê li Başûrê Kurdistanê tevbigerin. Her wiha bang li hemû aliyên Kurdî kirin ku kongreya netewî ya Kurdistanê di demeke lezgîn de lidar bixin.
Di çarçoveya helwestên li dijî dagirkeriya artêşa Tirk ya li ser Başûrê Kurdistanê, Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanê û Partiya Demokratîk a Kurdên Sûriyê PDKS'ê daxuyanî dan.
Her du partiyan di daxuyaniyên xwe de behsa destwerdanên dewleta Tirk li dewletên cîran kirin û dane zanîn ku Tirkiye hewl dide impratoriya Osmaniyan ji nû ve vejîne û Erdogan weke sultanê nû hilbijêre.
Di daxuyaniyan de hate gotin wê Qendîl bibe goristana dagirkeran.
Di daxuyaniyan de hate gotin ku dewleta Tirk rêbazên herî qirêj li dijî projeya demokratîk a welatiyên herêmê didan meşandin û alîkariyeke mezin bi komên terorîst re dikir da ku projeya welatiyan a demokrasiyê têk bibe. Piştî ku ev planên dewleta Tirk bi saya fedekariya şervanên Azadiyê hatin têkşikandin, niha Tirkiye rasterast herêmên Kurdan li dewletên cîran dagir dike û di dagirkeriya xwe de hemû pîvan û yasayên navnetewî binpê dike.
Di daxuyaniyan de hate got ku hikûmeta AKP'ê û serkêşê wê Erdogan ji destpêka aloziya Sûriyê ve destwerdana Sûriyê kir û alozî girantir kir û alîkariyeke mezin bi komên çete yên weke Cebhet El-Nusra û DAIŞ'ê re kir.
Di dawiya herdu daxuyaniyan de kiryarên Tirkiyê li dijî gelên herêmê hatin şermezarkirin. Her wiha bang li civaka navnetewî kirin ku li dijî van destdirêjiyên Tirkiyê tevbigerin.
Di daxuyaniyan de her wiha bang li hemû aliyên siyasî yên Kurdî yên herçar parçeyên Kurdistanê hate kirin ku yekîtiya xwe ava bikin û bi yek helwestê li dijî destdirêjiyên Tirkiyê li ber xwe bidin.


## Li Efrînê milkên sivîlan talan dikin



Rêxistina Çavdêr a Mafên Mirovan ragihand, li Efrînê ya dagirkirî komên bi ser Tirkiyê ve dest li ser mal û milkên Kurdên sivîl datînin û talan dikin.
HRW'ê bi daxuyaniyekê ragihand li herêma Efrînê mal û milkên Kurdan talan dikin. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin, ''Komên çekdar ên dijî hikûmetê, çekdarên xwe û malbatên wan li malên Efrîniyan bi cih kirin, bêyî ku tazmînatê bikin xwediyên mal û milk, mal û milkên sivîlan talan kirin.''
Wekîlê Dîrektorê Rêxistina Çavdêr a Mafê Mirovan, a Rewşên Lezigîn Prîyanka Motaparty got, ''Artêşa Azad a Sûriyê dema ku kete herêmekê karê wê ne ew e ku dest li ser mal û milkên sivîlên wir deyne û li malken wan bi cih bibe. '' Motparthy got, ''Ev çekdar mafê sivîlên bê parastin naparêze, berovajî pergala binpêkirinê didomînin.''
HRW'yê bi bîr xist ku bi dagirkeriya Tirk û çeteyên wê re, li gorî daneyên fermî 137.000 kes ji şûnwarê xwe bûne
HRW'ê bi du kesan re rûnişt ku berê li Efrînê diman û piştre xwe li Qamişloyê girtin. Hate gotin çeteyên OSO'yê dest li ser mal û milkên wan danîne, malê wan talan kirine û ziyana herduyan jî nedane wan.
HRW'ê bi got, ''Herdu kesan jî navê komên ku mal û milkên wan talan kirine dan'' û hate gotin navê van komên çete Ahrar El Şerqiye û Ceyş El Şerqiye ne.
HRW'ê diyar kir ku bi du Efrîniyên din re li derveyî Sûriyê jî axivî ne û got: ''Hiqûqa şer talanê û bi zorê desteserkirina milkên şexsî qedexe dike. Ev kirinên wiha ya li herêmên şer, sûcê şer e. Hêmanên şer, bicihkirina malbatên wan jî di nav de, nikarin dest li ser mal û milkên taybet deynin. Hiqûqa şer ji bilî hinceta divêtiya şer nikare ziyanê bide mal û milkê taybet.''HRW'ê diyar kir ku divê tazmînatê bidin wan kesên ku ziyan gihandine ser mal û milkên wan û kesên ku vegeriyane ser mal û milkê xwe divê mafê wan werin parastin.Bi berdewamî di daxuyaniyê de hate gotin, ''Rakirina mal û milkên taybet ên kesên ku ji şûnwarê xwe bûne, ziyana li ser mal û milkê wan, dibe sedemeke girîng ku ev mirov nikaribin vegerin ser cihê xwe.''

## Ji parlementer, parêzer û rojnamegeran nameya Ramîn

40 parêzer, parlamenterên berê, rojnamegerên Îranê ji bo betalkirina cezayê darvekirinê yê Ramîn Hisên Penahî daxwaznameyek pêşkêşê Rêberê Rejîma Îranê Elî Xameney kir.
Zêdeyî 40 parêzer, parlementerên berê yên Îranê û rojnamegeran bi boneya cejna Remezanê ji bo cezayê darvekirinê yê li Ramîn Hisên Penahî hatiye birrîn were betalkirin daxwaznameyek hevbeş pêşkê Rêberê rejîma Îranê Elî Xameney kirin.
Ev daxwaznameya ku di çapemeniya Îranê de jî cih girt, bi boneya Remezanê daxwaza rawestandina cezayê Penahî dike. Di daxwaznameya hevbeş de wiha têgotin,



"Demek pir kêm maye ji Cejna Remezanê re. Cejn tê wateya xweşî û bihevre bûnê. Bi vê boneyê em daxwaz dikin ku cezayê darvekirinê yê girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn Hisên Penahî were betalkirin.
Di heman daxwaznameyê de tê gotin ku welatiyên Kurd yên li van herêman bi çand û baweriya xwe dijîn, di vê cejnê de daxwaza betalkirina cezayê girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn dikin.
Her wiha hate gotin ku wê biryara Elî Xameneyî ya bi boneya vê cejnê ku jib o Ramîn bide bibe şahiya dê û bavan.



# Em li Minibicê Tirkiyê naxwazin

***Tirkmenên Minbicê diyar kirin ku piştî QSD'ê Minbic ji DAIŞ'ê rizgar kir ew ji her demê zêdetir azad in, jiyana wan aram e û gel wekhev dijîn û anîn ziman ku ew dewleta Tirk li Minbicê naxwazin. Tirkmenan got, "Dema ku DAÎŞ'ê li Minbicê teror dikir, Erdogan û leşkerên Tirkiyê li ku bûn?***



Tirkmenên li Minbicê destnîşan dikin ku ji her demê bêhtir ew azad in û dibêjin, "DAÎŞ Erdogan e. Ji bilî terorê Tirkiye tiştekî nade me. Em Tirkiyê naxwazin."
Tirkmenên li Minbicê diyar kirin ku ew naxwazin leşker û çeteyên Tirk li Minbicê bibînin û destnîşan kirin ku weke gelên Minbicê ew bi hev re bi rengekî azad û wekhev dijîn.
Serokê Komeleya Tirkmenên Minbicê Servet Sabrî anî ziman ku di dema DAÎŞ'ê de Tirkmenên li Minbicê jî mîna gelên din zilmeke mezin dîtin, lê niha bi gelên din re weke xwişk û bira dijîn.
Servet Sabrî got, "Dema destpêkê ku DAÎŞ'ê Minbic dagir kir, em li Minbicê bûn. Piştre me nema karîbû xwe li zilma wan rabigirin û em reviyan. Me dît ku DAÎŞ serê mirovan jê dike, êşkenceyê li jin û zarokan dike. Ji bo ji nava lepên DAÎŞ'ê rizgar bibin, em hemû tevlî pêngava rizgarkirina Minbicê bûn. Her wiha fermandarê me yê Tirkmen Botan Tirkmen jî di pêngavê de şehîd bû. Bi desteka QSD/YPG/YPJ'ê me Minbic rizgar kir."

### ERDOGAN DEMA DAÎŞ'Ê LI KU BÛ?

Servet Sabrî da xuyakirin ku wan li Minbicê sîstema xwe ava kirine, bi rengekî xweş dijîn û li ser planên dewleta Tirk ên li dijî Minbicê got, "Dewleta Tirk îdîa dike ku teror li vir heye. Dema DAÎŞ li vir bû, teror hebû. Dema ku DAÎŞ'ê teror dikir, Erdogan û leşkerên Tirkiyê li ku bûn? Dema ku DAÎŞ'ê serê mirovên me yên sivîl, zarokên me, jinên me jê dikir, ew li ku bûn? Çima em rizgar nedikirin? Em guh nadin Erdogan û ti karekî xwe li vir nîne. Em ne wî ne jî çeteyên wî dixwazin. Niha li vir em Ermenî, Ereb, Tirkmen bi hev re di nava aramiyê de dijîn."

### MINBIC ÊDÎ AZAD E

Fatma Tirkmen jî anî ziman ku weke jinên li Minbicê hewl didin birînên di dema DAÎŞ'ê ve vebûn, bipêçin. Fatma Tirkmen diyar kir, di dema DAÎŞ'ê de ew li Minbicê bû, mêr li meydanan dihatin kuştin û serê wan dihatin jêkirin, jiyan li jinan hatibû herimandin û got, "Di dema operasyona rizgarkirina Minbicê de, gava DAÎŞ li vir bû me berê xwe dan nava QSD'ê. Lê belê DAÎŞ'ê rê mayin kiribû. 8 zarokên apê min, xwişk û xizmên min pê li mayinan kirin û mirin. Du pismamên min di destê DAÎŞ'ê de ne û 3-4 sal in em agahiyê jê nagirin. Bi hatina QSD'ê re bêhn hate ber me. Em êdî azad in."

### EM DAÎŞ'Ê Û BAVÊ DAÎŞ'Ê NAXWAZIN

Fatma Tirkmen destnîşan kir ku jinên Minbicî yên ji DAÎŞ'ê rizgar bûne êdî li her qada jiyanê hene û diyar kir, ew DAÎŞ'ê û dewleta Tirk ku bavê DAÎŞ'ê ye naxwazin. Tirkmen got, "Jin êdî dixebitin û meclîsên jinan vebûne. Dema ku şîdet li jinekê dibe, jin serî li meclîsa jinan dide û kî sûcdar be meclîs li gorî wê biryarê dide. Wekî din jin dibin xwedî kar, ji xwe re kargehan vedikin. Yên dixwînin jî dikarin bibin mamoste û li nexweşxaneyan bixebitin. Tirkiye dixwaze dîsa DAÎŞ'ê bîne ser serê me. Ji ber ku ew bi xwe DAÎŞ e. Bavê DAÎŞ'ê dewleta Tirk e. Hatina Tirkikyê tê wateya hatiya DAÎŞ'ê. Em naxwazin Tirkiye bê."…***ANF***

## Êrîş li ser tevahî Kurdistanê ye


PYD'ê destdirêjiya li ser Başûrê Kurdistanê wekî destdirêjiya li ser tevahî gelê Iraq û Kurdistanê bi navê kir û bang li partiyên Kurd kir ku demildest kongreya netewî ya Kurdistanê li dar bixin.
Partiya Yekîtiya Demokraîtk PYD'ê têkildarî gefên dagirkeriya Tirkiyê yên li dijî Başûrê Kurdistanê daxuyanî da û bang li tevahî partiyên Kurdistanî kir ku demildest Kongreya Netewî ya Kurdistanê li dar bixin.
Daxuyanî wiha ye:
Êrîşên Tirkiyê li dijî Başûrê Kurdistanê û israra rêjîma Tirkiyê ya mayîna li wan herêman binpêkirineka serweriya xaka welatekî din û binpêkirina qanûnên navnetewî ye.
Tirkiye bi pergala xwe û siyasetên xwe yên qirkirin û inkarkirina gelê Kurd bingeha hemû krîzên Rojhilata Navîn e.
Di heman demê de ew bi xwe jî di qeyranekê de ye û nikare derbas bike. Aloziya siyasî û rewşa awarte ketiye sala xwe ya 3'yemîn de. Dewleta Tirkiyê ji hemû beşên civakî, jin û ciwan, akademisyen, leşker, dadwer, mamoste, rojnamevan, hiqûqnas girtine. Yên ku li dijî fermanên wan derdikevin weke teror tên bi nav kirin. Bi rastî Tirkiye veguherî ye girtîgeheke mezin. Şansê mayîna hikumeta AKP'ê li ser desthilatiyê pir kêm e.
Erdogan bi kuştin û rûxandinê, bi hêncetên ne di cih de dixwaze xewna xwe ya dagirkirina Başûrê Kurdistanê bi cih bîne, bala gelê Tirkiyê ji krîza hundirîn bikşîne ser derve û serkeftina xwe ya di hilbijartinên 24'ê Hezîranê misoger bike. Heger niha çavê wê li Başûrê Kurdistanê ye paşê dê berê xwe bide herêmên Iraqê.
Wekî Meclîsa Giştî ya PYD'ê em dijminahiya dagirkeriya Tirkiyê li Başûrê Kurdistanê şermezar dikin û wekî dijminahiyeke li ser tevahî Iraq û Kurdistanê dibînin. Mebesta Tirkiyê ne tenê Qendîle lê belê dagirkirina Zaxo, Hewlerê, Şengal û Nînowa ye jî.
Em bang li civaka navdewletî, Neteweyên Yekbûyî, Konseya Ewlekariyê dikin li hemberî zêdegaviyên Tirkiyê erka xwe bi cih bînin.
Em bang li tevahî partiyên Kurd û Kurdistanî yên li Sûriyê, Iraq, Tikriyê û Îranê dikin ku ji bo lidarxistina kongreya Netewî ya Kurdistanê bixebitin. Lidarxistina kongreyê êdî pêwîstiyeke.
Em bang li hemû hêz, partiyên niştimanî û demokratîk ên Iraq û Sûriyê dikin ku li hemberî dagirkeriya Tirkiyê bisekinin."

## Berxwedana Efrînê ruyê herkesî eşkere kir



Tevgera Civaka Demokratîk bi civînekê pêşketinên dawî ji şêniyên gundên Ehdas ê navçeya Fafîn a kantona Şehbayê re nirxand. Di civînê de hate gotin ku berxwedana Efrînê ruyê rast yên her kesî eşkere kir.
Tevgera Civaka Demokratîk bi armanca nirxandina pêşketinên dawî, civînek li gundê Ehdas ê navçeya Fafîn a Kantona Şehbayê re lidarxisitn. Bi dehan şêniyên gund û welatiyên Efrînê di civînê de amade bûn. Endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Hesen Koçer di civînê de axivî û diyar kir ku aloziya Sûriyê bi çek û destwerdana derve nayê çareser kirin, çareserî bi riya hevdîtinên aliyên Sûrî wê pêk were.
Hesen Koçber bal kişand ser bêdengiya raya giştî ya di derbarê rewşa Efrîniyên li Şehbayê got, "Civaka navdewletî derbarê rewşa şêniyên Efrînê yên li Şehbayê hê jî bêdeng in, kompioyên dagirkeran ên li dijî gelê Efrînê hê berdewam e. Berxwedana Efrînê ruyeê rast yên her dewletekê eşkere kir."
Civîn bi dirûşmeyên silavkirina berxwedana Efrînê, YPG û YPJ'ê bi dawî bû…***ANHA***

## Demîrtaş bersiv da Erdogan



Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş bi rêya Twitterê bersiv da Erdogan ku li ber namzetiya wî ya Serokkomariyê rabû.
Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş ku li Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê dîl tê girtin, bersiv da Serokê Giştî yê AKP'ê Erdogan ku li ber namzetiya Demîrtaş rabû û got, "Divê şert û mercên wî li namzetiya Serokkomariyê bê. Pêwîste ev şaşitî were sererastkirin."
Demîrtaş bi rêya Twitterê ev bersiv da: "Binere, vê carê ez tevlî te dibim Erdogan. Sermeselê, ji bo tu bibe namzetê Serokkomariyê divê teqez dîplomaya te ya zanîngehê hebe. Lê belê heta niha kesî dîplomaya te nedîtiye. Krîterên min li namzetiyê tên, lê yên te bi guman e."



## Li Girê Sipî pişta dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ şikest

Mihemed SEYDÎ

Îro 3 sal di ser rizgarkirina Girê Sipî re derbas dibe. Bajarê ku gelek dest guhertin, ger gotin di cih de be reng û cilên çetên li wir ji aliyê xwediyên wê ( dewleta Tirk) ve dihatin guhertin.
Girê Sipî bi sipîbûna axa xwe tê nasîn, lê dewleta tirk bi çeteyên rengê wan û dengê wan ê hov û reş xwestin vî bajarê ku ji mûzayîkekî gelan pêk tê hem jiyana li wir him jî rengê wê reş bikin. Rewşekî bi vî awayî li herêmê derketibû ku dewlet Tirk her roj komên cûda avadikirin û navên cûda li wan dihat kirin. Ji serê kaniyê, girê spî, cerablûs û heta ezaz û idlib bi dehan kom li wir bi destê dewleta Tirk hatin avakirin û bingeha DAIŞ'ê dihat çêkirin.
Piştî têkçûna gelek ji van koman li hember hêzên bi pêşengiya kurdan, dewleta Tirk ket nava metirsiyeke mezin. Metirsiya wê him ew bû ku pîlanên wê yên dagirkeriyê têk biçin hem jî roj bi roj mezinbûn û avabûna statûya li rojavayê kurdistanê bû.
Vê carê jî xwest derbekî mezin li pirojeya rojavayê kurdistanê bixe û rê li pêşiya wê bigre. Ji ber wê jî berê DAIŞ'ê da herêmên rojava û hemû komên li van herêman ku bi destê dewleta Tirk hatibûn avakirin girêdana xwe ya bi DAIŞ'ê re raghandin.
DAIŞ xist dewrê û armanc têkbikrina projeya li rojava dihate avakirin bû. lê wê nizanîbû wê ev êrîş bibe destpêka hemû pîlananên dewleta Tirk têk bibe û pişta wê û çeteyên wê bişkîne..
DAIŞ'a ku 15 îlona 2014 êriş bir ser kobanê di 15 hezîrana 2015 li girê sipî têk çû.
Bi vê têkçûnê re pira di navbera dewleta tirk û paytexta Xilafeta DAIŞê (Reqa) hat qûtkirin. ev jî derbeke mezin bû jib o dewleta Tirk li herêmê.
Dewleta Tirk bi vê hêrsa têkçûna xwe li girê sipî bi destê çeteyên DAIŞ'ê di 25'ê hezîrana heman sale li Kobanê komkujiya ku bi dehan jin zarok û kesên bi temen mezin bûn qurbanî pêk anî. Heman komkujî û bi heman rêbazî li girê sipî jî êriş pêk anî û çete di Sînor re derbasî van deveran kirin. Ev komkujî û êriş ji bo şikandina îradeya gelên li herêmên rizgarkirî bû, lê her car têk diçû.
Bûyerên ku me rêz kirin hemû di nava pêvajoya têkbirina dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ'ê li herêmê de qewimîn û armanc ew bû ku dewleta Tirk bibêje em ê nehêlin win rihet bijîn.
Lê rewşa ku îro di salvegera rizgarkirina bajarê Girê Spî tê dîtin û pîştî sê salan, ew e ku gelên vê herêmê wê rênedin piştî ewqas bedel kes were û li ser wan bibe desthilatdar. Êdî bi rengê xwe, bi çanda xwe, bi ol û baweriyên xwe yên cûda bi hev re dijîn. Gel xwe bi rê ve dibe û saziyên xwe avakirin û ava dike.
Êdî rengê girê sipî heye, ew jî rengê gelên girê spî ye, kurd, ereb û hwd.
Li girê spî pişta dewleta Tirk û çetên DAIŞ şikest û gelên herêmê bi serketin.